Em nizanin wê encama vî biryara Îngilîstanê çi bibe. Gor em teqmîn dikin wê ev biryar zêde nebe sedemê helwestekî piratîk li dijî saziyên gelê kurd. Lê belê girtina vî biryarê bi serê xwe weke gotinekî vala jî nikare were dîtin. Çi dibe bila bibe, ev helwesta dewleta Îngilîstanê li dijî kurdan û nirxên wan hatiye girtin. Kes nikare li benda helwestekî din a objektîf bimîne. Heke di warê siyasî de li vê biryarê were mêze kirin, ev biryar weke êrişekî li dijî nirxên gelê kurd e. Divê were zanîn ku PKK an jî KONGRA-GEL li vî welatê ti xwedî hebûnekî saziyê nî nin lê belê, tê zanîn ku bi hezaran kurdên ku li vî welatê dijîn van rêxistinan hez dikin û wan diparêzin. Hejmara van kesan bi sed hezaran dikere were hejmartin. Lêbelê dîsa jî kes nikare vî biryarê vala û bê tesîr bibîne. Di rojên pêş de mumkune ku di pratîkê de jî hin bûyerên negatîf biqewumin. Heke rewşekî wisa derkeve holê, divê kes şaş ne be. Çiqas jî bûyerên pir bi xeter nikaribin derkevin, heke kurd bi hemî beşên xwe nebin xwedî helwestekî pêwîst, dîsa jî wê hinekî berjewendiyên gelê kurd bikevin tengasiyê.

Weke Îngilîstanê, Almanya jî tim li hember gelê kurd xwedî helwestekî neyênî bûye. Digel pêşketinên demokratîk û krîterên mafên mirovan li Ewropayê, mixabin dewleta Almanya îro jî li hember saziyên kurdan xwedî helwestekî neyênî ye. Saziyên kurdan, yên çandî û civakî tim ji alî hêzên ewlekariyê yên Alman ve têne hêşandin. Bê ku ev sazî ti karekî bê zagonî bikin, polîsên alman wan nerehet dikin, endamên wan ditirsînin û pir caran jî rayedarên wan digrin bin çavan. Îro pir rayedar û xebatkarên van saziyên kurdan di zîndanên Almanya'yê de ne. Pir rayedarên saziyên kurdan jî bi pera hatine ceza kirin. Lewma, pir kurd hene ku li vî welatê naxwazin û nikarin bibin endamên saziyên kurdan, an jî rayedarên wan.

Rola Helwesta Kurdan û Ciwan

Li hember dijberiya kurdan tim berxwedanekî hatiye meşandin. Bi taybetî kurdên li Almanyayê bê deng nemane. Bê guman di roja îroyîn de jî li hember vî nêzîkatiya dewletên Îngilîstan û Alman divê bê dengî tinebe. Lê belê ev bêdengî divê bi rêbazên demokratîk û di çarçoveya qanûnan de be. Li her welatê Ewropayê derfetên ku kurd bikaribin bikar bînin hene. Heke bi aqil nêzîkatî çê be wê helwestekî pir bi tesîr derkeve holê.

Di vî warê de rola cîwanan xwedî girîngiyekî mezin e. Ez vê tiştê tenê ji bo ku cîwan xwedî hêzekî dînamîk in bilêv nakim. Dema ku em li diyaspora kurdên li Ewropayê dinêrin, beşa wî ya herî bi derfet cîwan in. Bi taybetî di warê fêmkirina mentalîteya ewropî û qanûnên wan de ev beş pir dewlemend e. Di warê jîrbûna fîzîkî de jî ev beş xwedî hêzê ye, di warê zanabûnê de jî. Lewre em dikarin pir kar û xebatê ji cîwanan bixwazin.

Di roja îroyîn de cîwanên kurd xwedî şansên mezin in. Cîwanên ti civakê tine ne ku qasê yê kurdan xwedî şansê mezinbûyînê bin. Di her warê de cîwanên kurdan dikarin hêza xwe bikar bînin. Bi taybetî li welatên YE'yê de derfetên ku cîwan ji gelê xwe re bi feyde bin pir in. Li hember helwestên dewletên Alman û Îngilîstanê rêyên tekoşînê pir dikarin werin fireh kirin. Bi hezaran cîwanên kurd ku li Almanyayê û li Îngilîstanê dijîn dikarin bi rêya partiyên siyasî û saziyên sîvîl rayedarên van dewletan tengav bikin. Lê ji bo vî yekê jî pêwîste ku têkîliyên cîwanên kurd bi wan partî û saziyên sîvîl re baş bin. Divê di nava wan saziyan de cîwanên kurd xwedî hêz bin. Bê guman ev jî bi tevlêbûna karê giştî yên wan saziyan pêk tê. Lewma, berê her tiştî divê cîwan xwe di nava saziyên polîtîk û yên civakî de bi hêz bikin.

Dema ku em divêjin bila cîwan xwe di nava saziyên ewropî de bi hêz bikin, divê ku xeteriya helandinê jî neyê jibîr kirin. Qasê ku cîwan dikarin pir derfetan bikar bînin waqas jî ew dikarin xirab werin bikar anîn. Çewa ku pêşeroja gelan bi cîwanên wî ve girêdayî ye, wisa jî pêşeroja gelan dikare bi destê cîwanan bikeve nav xeteriyê. Lewre, divê were zanîn ku dewletên weke ya Alman û ya Îngilîstanê, bi taybetî ji bo helandina cîwanên kurd, pir projeyan dixin û xistine rojevê. Heke ev pîlan neyên zanîn û li dijî wan şiyarî tinebe, bê guman kes nikare ji cîwanên kurd zêde hêviyan bike. Ji ber vê yekê, berê her tiştî divê ku cîwanên kurd xwedî zanistiyekî siyasî û civakî bin. Divê siyasetên van dewletan baş were zanîn.

Tanzîmbûyîna cîwanan dikare civaka kurd li Ewropayê bike xwedî hêzekî diyasporal. Heke kurd bikaribin bibin xwedî hêzekî diyasporal, di warê dîtina çareseriyekî siyasî û dîplomatîk de jî wê pêşketin baştir çê bibin. Mixabin em hê nikarin ji bo hêza cîwanên kurd li Ewropayê vî rastiyê bînin ziman. Bingehî heye lê belê, gor em dixwazin û gor pêwîstiyên tekoşînê, hê kêmasî jî pir in. Lewre, di van salên ku çareserî wê pêş bikeve de rola cîwanan pirtir derdikeve pêş. Em jî ji bo vî yekê xwedî hêvîyên mezin in.